# BUROYA KURDÎ
# ya Pêwendî û Agahdariyê

**Bultena agahdariyê N° 52 - Tebax 2009**
Quai aux Pierres de Taille (Arduinkaai) 11, 1000 Bruxelles - Tél. 02 219 80 60
www.kurdishbureau.be kurdishbureau@scarlet.be

www.arsivakurdi.org

## NÛÇE JI KURDISTANÊ

### TÎRMEH 2009

## KURDISTANA TIRKIYÊ

**BÎRÊN MIRINÊ (dûmahîk)**
***Di destpêka Tîrmeh 2009 de***, di dema kolanên li navçeya Licê, li Kurdistana Tirkiyê, hestiyên du miriyan hatin dîtin. Tê bawer kirin ku ew yên Sadiq Ulumaksan û kurrê wî Seyithan in. Di 1997 de, ev her du gorî (qurban) ji aliyê hêzên taybetî JITEM, dema ku ew diçûn Wêranşarê, hati bûn revandin. Heta nuha, haya tukesî ji wan nîn e.
*(netkurd.com, serwext.com, 02.07.2009)*

***Cardin di destpêka Tîrmehê de***, zarokan nêzîkî 10 hestiyên serî yên gullekirî li taxa Şabaniyê, li Wanê, dîtin. Polîs vekolîna xwe dest pê kir. Ew bawer dike ku ev hestî ji gorekê hatine derxistin û li vê taxê tevî axê hatin rijandin.
*(netkurd.com, rizgari.org, serwext.com, peyamner.com, 03.07.2009)*

***Di 21 Tîrmeh de***, bi fermana dozkar (prokuror), li Birecikê, parêzgeha Hekarî, kolan dest pê kir. Ev yek, piştî nameyeke serbazekî (esker) kevn ku got ku ew guwahê (şahid) kuştina 12 kesan di 1994 bû. Ev kes hunda bû bûn, piştre hati bûn kuştin û gor kirin.
*(azady.nl, 23.07.2009)*

**NAMÎLKE BI KURDÎ Û TIRKÎ**
***Di 06 Tîrmeh 2009 de***, şaredarê kurd ê Surê, li bajarê Diyarbekirê, Abdullah Demirtaş, dest bi kampanya paqijiyê kir. Wî bixwe, li ber her deriyî û li firoşgehan (dikkan), namîlke (broşur) li ser vê babetê, bi kurdî û tirkî, belav kirin.

Bi vê kirinê, Demirtaş peyt (isbat) kir ku ew li ber fişarên (zaxt) dewleta tirkî sist nabe (ji berê, ew û encumana şaredariyê ji sedema belgeyên agahdariyê bi kurdî ji karê xwe hati bû dûr xistin).
*(serwext.com, 06.07.2009)*

**DI 6 MEHAN DE 131.349 PELIXANDINÊN MAFÊN MIROV LI KURDISTANÊ**
***Di Tîrmeh 2009 de***, şaxa Diyarbekirê ya Rêxistina Mafên Mirov rappora xwe ya şeşmehî ya 2009 weşand. Ew ji aliyê serokê wê Muharrem Erbay, di konfêranseke çapemeniyê de, li eywana rêxistinê, li Diyarbekirê, hat pêşkêş kirin.

Rappor amaje (işaret) dike ku di 6 mehên dawîn de, 131.349 pelixandinên mafên mirov li Kurdistanê bûne. Ji wan, bêparkirina (mehrûmkirin) 112.018 kesan ji karta wan a kesk ((karta tibbî), ji bo ku wan deng da partiya ku bi awakî ne fermî kurdî ye, DTPê. Û ew dibêje jî ku ev pelixandin piştî hilbijartinên dawîn ên şaredariyî gelek bêtir bûn û ku ew li girtiyan, jinan, baweriyên olî jî bûn. Li dawiyê, rappor dibêje ku jimara van pelixandinan li gora salên dawîn du qat bûye.
*(netkurd.com, 10.07.2009)*

## WAJOKIRINA (IMZA) PROJEYA BORIYA GAZA ASYA NAVÎN-IRAQÊ




***Di 13 Tîrmeh 2009 de***, projeya boriya gazê « Nabucco », ya Asya Navîn-Iraqê, li Ankara, bi serokatiya werokwezîrê tirk, Recep Tayyıp Erdoğan, hat wajo (imza) kirin. Di merasîmê de, serokwezîr yan nimînendeyên Otrîş (Avusturya, Nêmsa), Bulgarya, Hongarya û Rûmanya, û serokê Kommisyona Ewropî, José Manuel Barroso, amade bûn. Bi ser de jî, serokwezîrê Iraqê, serokê Gurcistanê, nimînendeyekî Azarbaycanê û nimînendeyê sekreterê Dewletê yê amerîkî ji bo Ênêrjiyê beşdarî wê bûn.

Van welatan ev lihevkirin wajo kir ji bo ku altêrnatîvekê ji gaza Rûsya re bibînin. Çarîkê gaza xwezayî (tabîî) ku li Ewropa tê bi kar anîn nuha ji Rûsya tê. Nelihevkirinek di navbera Rûsya û Ukranya, ku xaleke tranzîtê ya bingehî ye, de gelek zarar anîn şandina gazê ji Ewropa re.

Ewê gaz ji Asya Navendî û Kurdistana Iraqê bên şandin Ewropa û ewê ji Kurdistana Iraq, Sûriye û Tirkiyê derbas bibe.

¨Projeya Nabucco, ku di 2002 de hat dest pê kirin, ewê di 2014 bê bi cî anîn. Tê texmîn kirin ku masrafa wê ewê 7,9 milar € be.
*(peyamner.com, netkurd.com, 13.07.2009; Metro, 14.07.2009)*

## KONSULXANA AMERÎKÎ SEREDANA PARTIYA DTPê DIKE

***Di 15 Tîrmeh 2009 de***, karbidestên konsulxana amerîkî li Adana çûn seredana serokê şaxa Mêrdînê ya partiya kurdî DTPê, Davud Bozan.

Şande ji berpirsiyarê karên ramyarî (siyasî), Kurt B. Halberg, û alîkarê danişmendê (muşawir) aborî, L. Turner, hat pêk anîn. Her du alî li ser rewşa aborî û ramyarî li Kurdistana Tirkiyê peyivîn.
*(avestakurd.net, 16.07.2009)*

## BAVEKÎ KURD JI DADGEHÊ DIXWAZE KU SIRÛDA NETEWEYÎ LI DIBISTANAN BÊ RAKIRIN

Piştî kampanya rêxistina Mazlum-Der ku rakirina sirûda neteweyî ya tirkî „Sonda me“ li dibistanan xwest, bavê xwendekarekî kurd, Selahettin Çoban, li bal Dadgeha Bilind gilî kir. Wî, bi riya parêzerên (avukat) xwe, Abrurrahim Ay û Muzeyyen Boylu, jê re got ku ev sirûd pesna tirkîtiye dide û gelên din nizm dike.
*(netkurd.com, 17.07.2009)*

## RAPPORA „MINORITY RIGHTS GROUP“

***Di 17 Tîrmeh 2009 de***, rêxistina Minority Rights Group (Koma Mafên Hindikayiyan) rappora xwe ya dirêjtirîn li ser perwerdê li cihanê weşand. Di beşên li ser Tirkiye, Îran û Sûriyê de, rappor dibêje ku li van dewletan bitenê zimanên tirkî, farisî û erebî li dibistanan bi destûr in û li ser pelixandinên van dewletan dipeyive. Û ew balan dikişîne jî rewşa Yezîdiyan.
*(avestakurd.net, rizgari.org, kurdistan-news.net, 17.06.2009)*

## LEYLA ZANA TÊ TAWANBAR KIRIN

***Di 27 Tîrmeh 2009 de***, dadgeheke tirkî Banû Leyal Zana, parlementera kurd a berê, bi salek û 3 meh zîndan tawanbar kir. Ev yek ji bo axaftineke ku wê berê demeke nêzîk li zanîngeha Soasê, li Londonê, kir, li gora bend 7/2 ya zagona cezayî ya tirkî.

Banû Zana li Londonê goti bû ku ji bo gelê kurd, PKK û Öcalan weak dil û mejî ji bo mirovan in !
*(netkurd.com, avestakurd.net, rudaw.net, Hürriyet, 28.07.2009)*

www.arsivakurdi.org

## ÊRÎŞ LI NAVÇEYÊN KURDÎ YÊN EREBKIRÎ

***Di 01 Tîrmeh 2009 de***, birêvebirê polîsê Kerkûkê, Serhed Qadir, ji ajansa PNA re da zanîn ku erebeke mînkirî li taxa Zabê li Kerkûkê, li nêzîkî yekîneyeke polis teqiya. Polîsek hat kuştin û 6 sîvîl hatin birîndar kirin.
*(peyamner.com, 02.07.2009)*

***Di 10 Tîrmeh de***, birêvebirê polîsê taxa Azadî li Kerkûkê, Bêstûn Qefarî, da zanîn ku çekdarên nenas muxtarê taxa Şorêcê, ya bajarê Kerkûkê, Kemal Muhammed Şerîf, kuşt. Vekolînek dest pê kir.
*(pukmedia.com)*

***Di 31 Tîrmeh de***, berpirsiyarekî polîsê Kerkûkê da zanîn ku erebeyeke mînkirî li taxa Azadî, li Kerkûkê, teqiya. 2 sîvîl hatin kuştin û 22 jî birîndar kirin.
*(pukmedia.com, 01.08.2009)*

## RAPPOREKE BRÎTANÎ LI SER KURDISTANA IRAQÊ




***Di 14 Tîrmeh 2009 de***, şandeke parlementerî ya brîtanî « All Party Parlementary Group » rappora xwe li ser Kurdistana Iraqê, li parlementa brîtanî, li Londonê pêşkêş kir.
Şanda ku di Nîsan 2009 de çû bû seredana Kurdistana Iraqê (seredana 2mîn) ji van kesahiyan pêk hati bû : Derek Wyatt, ji partiya karkeran „Labor“; Tobias Ellwood, ji partiya konsêrvatîf; Peer Lord û Clement Jones, ji partiya lêbêral dêmokrat; Mark Phillips, serokê konsêrvatîf yê yeneya (êkîp) Baroness Neville-Jones Shadow, wezîra ewlehiyê, û Gary Kent, birêvebirê „All Paty Parliamentary Group“ û yê Hevalên Karker ên Iraqê (Labour Firnds of Iraq). Ew rastî berpirsiyarên ramyarî û olî, sendîka, rêxistinên jinan ... hati bû.
Rappor ji 24 rûpelan pêk hatiye û tê de kurteya tewsiyeyên Şandê hene : *„Em piştgiriya pêwendiyên ramyarî, dîplomatîk û bazarganiyî yên kûrtir û firehtir di navbera Brîtanya Mezzin û Herêma Kurdistanê de dikin. Biserketina herêmê ewê Iraqê xurttir bike û ev di berjewendiya (menfeet) ramyariya derve ya Brîtanya Mezzin û aşîtî û ewlehiyê li Rojhilata Navîn de ye“*.
Piştre, rappor dîtina şandê li ser rewşa çandin(ziraet), geşt (tûrîsm), perwerde, spor û cuhanan, mafên karkeran, ewlehiya derve û hundir, pêwendiyên bi Bexdad û Tirkiyê re, nijadkujiya kurdî „Enfal“, alîkarî û çavdêriya derve û hindikayiyan (fille, yezîdî) ... ravedike. Û ew pirsên gendelî (ruşwet), mafên jinan û azadiya çapemeniyê jî amaje (işaret) dike.
Nimînendeya Hukûmeta Herêma Kurdistana Iraqê li Londonê, Banû Beyan Samî Abdulrahman, rappor û tewsiyeyên wê baş pêşwazî kirin. Serokê encumena bijare ya karên derve ya parlementê, Mike Gapes, û nêzîkî 70 nimînendeyên „think tanks“, çapemenî, karsazî „business, hukûmet, balyozxane (sefaretxane) û civakên kurdî û erebî ku li Brîtanya Mezzin dijîn, beşdarî vê civînê bûn.
*(krg.org, peyamner.com, 15.07.2009; pukmedia.com, 16.07.2009)*

## BÎREK Û PARZÛNEKE PÊTROLÊ

***Di 18 Tîrmeh 2009 de***, merasîma vekirina bîreke pêtrolê li Xormelê, 10 km li Başûrê Hewlêrê, û parzûneke (raffinerie) pêtrolê li Xebatê, li Rojavaya Hewlêrê, bi beşdarbûna serokwezîrê Kurdistanê, Nêçîrvan Berzanî; wezîrê kaniyên sirûştî (tabîî), Aştî Hewramî, û balyozê (sefîr) berê yê amerîkî li Iraqê, Zalmay Xalid Zad, bû. Ewê borî pêtrola Xormelê ber bi parzûna Xebatê, ji bo bikaranîna hundirî, bikişînin.
*(pukmedia.com, 18.07.2009; avestakurd.net, 19.07.2009; Al-Hayat, 20.07.2009)*

www.ArsivaKurd.org

**HILBIJARTIN LI KURDISTANÊ**



***Di 25 Tîrmeh 2009 de***, li Kurdistana Iraqê hilbijartinên parlementerî û serokî bun. Berê du rojan, nexweş, girtî û pêşmerge deng da. 45.000 çavdêr, ku ji wan 350 ji Yekîtiya Ewropî, Amerîka û Lîga Erebî, çavdêriya van hilbijartinan kir. Rêjeya (nisbet) beşdarbûna dengdêran gelek bilind bû, ji 78% bêtir, û hilbijartin bi awakî durust derbas bûn. Yekîtiya Ewropî, Amerîka û Lîga Erebî ev yek dilniya (te'kîd) kir û pêkanî pîroz kirin.

Ji bo hilbijartinên serokî 5 namzed (kandîdat) û yên parlementerî 24 lîste hebûn.

***Di 29 Tîrmeh 2009 de***, Encumena Bilind a Serbixwe ya Hilbijartinan encamên dawîn li Bexdadê dan zanîn :

***Hilbijartinên serokî***

1. Mesûd Berzanî 69,57% (cara 2mîn dibe serokê Kurdistanê)
2. Kemal Mîrawdalî 25,32%
3. Helo Ibrahîm Ehmed 3,49%
4. Seffîn Şêx Muhammed 1,4%
5. Huseyn Germiyanî 0,59%

***Hilbijartinên parlementerî***

1. Lîsta Kurdistanî 57,34%. Ew ji her du partiyên mezzin, Partî Dêmokratî Kurdistan « PDK », a Mesûd Berzanî, û Yekîtî Niştimanî Kurdistan, a Celal Talabanî, pêk hatiye.
2. Goran 23,75%. Ew ji aliyê Noşîrwan Mustafa, ku ji Yekîtî Niştimanî veqetiyaye, hatiye pêk anîn.
3. Lîsta Xizmetguzarî û Sazkarî : 12,8%. Ew ji 4 partiyan, du islamî û 2 marksîst, pêk hatiye.
4. Bizava Islamî ya Kurdistanê : 1,45%
5. Bizava Dêmokratîk a Tirkmenî ya Kurdistanê : 0,99%
6. Lîsta Azadî û Edaleta Civakî : 0,82%
7. Encumena Gelê Kildanî, Suryanî û Aşûrî : 0,58%
8. Sazkariya Turkmenî : 0,38%
9. Rafideyn (Mêzopotamya) : 0,3%
10. Aram Şahîn Dawûd (Ermenî) : 0,22%
11. Tirkmenên Hewlêrê : 0,21%
12. Partiya Karker û Rencderên Kurdistanê : 0,18%
13. Yosen Serkîsyan (Ermenî) : 0,15%
14. Partiya Parêzgarên Kurdistanê : 0,13%
15. Lîsta Bizava Sazkariya Kurdistanê : 0,11%
16. Yekîtiya Neteweyî ya Dêmokrat a Kurdistanê : 0,10%
17. Gencên Serbixwe : 0,10%
18. Yekîtiya Neteweyî ya Dêmokratîk a Kurdistanê : 0,1%
19. Kildana Yekgirtû : 0,09%
20. Hukmê Zatî yê Kildanî, Suryanî û Asûrî : 0,09%
21. Ayindeya Geş bo Kurdistanê : 0,05%
22. Işxan Serkîsyan (Ermenî) : 0,05%
23. Partiya Destûra Iraqê : 0,04%
24. Bêaliya Tirkmenî : 0,02%

Li Parlementa Kurdistanê 111 kursî hene. Berê hilbijartinan, wê biryar stendi bû ku 11 ji wan bide hindikayiyan : 5 ji Tirkmenan, 5 ji Asûrî-Kildaniyan û 1 ji Ermeniyan re.
*(Malper û Têlêvîzyonên kurdî, rojnameyên erebî û tirkî, 30.07.2009)*

**SEREDANA WEZÎRÊ AMERÎKÎ YÊ PARASTINÊ**
***Di 29 Tîrmeh 2009 de***, piştî seredana Bexdadê, wezîrê amerîkî yê parastinê, Robert Gates, çû Kurdistanê û tê de rastî serok Mesûd Berzanî hat. Amanca seredana wî nemaze giftûbêjkirina nelihevkirinên di navbera hukûmetên Herêma Kurdistanê û ya Bexdadê de li ser navçeyên erebkirî, pêtrol û erkê pêşmergan bû.
*(peyamner.com, aknews.com, netkurd.com, avestakurd.net, 29.07.2009)*

www.arsivakurd.org

**BIDARVEKIRINA 3 KURDAN**

***Di 17 Hezîran 2009 de***, Kurdek, Huseyn Sebûrî, li zîndana navendî ya Sinê, li Kurdistana Îranê, hat bi dar ve kirin.

Piştî ku ew bi kuştinê hati bû tawanbar kirin, Sebûrî di 2005-2006 de reviya bû Kurdistana Iraqê, piştre vegeriya bû Îranê û tê de 4 salan li zîndanê ma bû. Mafê wî ne bû ku parêzerekî (avukat) bigire.
*(hra-iran.org, 02.07.2009)*


***Di 09 Tîrmeh de***, Mahmûd Mahmûdpûr li zîndana navendî ya Neqadê, li Kurdistana Îranê, hat bi dar ve kirin. Heta nuha tukes sedema vê kuştinê nizane.
*(hra-iran.org, 15.07.2009)*

***Di 12 Tîrmeh 2009 de***, piştî derbaskirina 5 salan li zînadê, Yûnis Aqayan li zîndana Urmiyê, li Kurdistana Îranê, ji bo ku wî bi ola „Yarî“ bawer dikir, hat bi dar ve kirin.
*(hra-iran.org, 19.07.2009)*

**TAWANBARKIRINA ROJNAMEVANEKÎ**

***Di 01 Tîrmeh 2009 de***, rojnamevanê kurd, Adnan Hasanpûr, bi 10 sal zîndan hat tawanbar kirin. Di 2007 de, ew ji aliyê dadgeha şoreşgerî ya Merîwanê, li Kurdistana Îranê, bi hukmê îdamê, ji bo *„çalakiyên li dijî ewlehiya neteweyî, sîxurkirin (casûsîtî) û propaganda veqetînxwaz“*, hati bû tawanbar kirin. Piştî kampanyake navneteweî, biryar hat stendin ku ew ji nuh de bê dadgeh kirin. Ew nuha li zîndana Sinê ye. Rêxistina Reporterên Bê Sînor banga azadkirina wî kir.
*(netkurd.com, 03.07.2009)*

**SERSALIYA 20mîn A KUŞTINA DR. QASIMLÛ LI OTRÎŞÊ**



***Di 13 Tîrmeh 1989 de***, Dr. Abdulrahman Qasimlû, sekreterê giştî yê Partî Dêmokratî Kurdistana Îranê (PDKÎ), tevî du hogirên xwe, Abdullah Qaderî Azarî û Fadil Resûl, ji aliyê « diplomatên » îranî li Viyenna, li Otrîşê (Avusturya, Nêmsa), hat kuştin.



Her du alî ji bo giftûbêjkirina mafên Kurdên Îranê civiya bûn, lê nimînendeyên Komara Islamî ya Îranê kujer (qatil) derketin ! Li gel peytên (isbat) bêgûman, hukûmeta otrîşî ne hişt ku dadî (edalet) vekolîna (ankêt) xwe li ser vê babetê çêke.

***Di Gulan 2009 de***, parlementerekî otrîşî, Peter Pilz, serokê nuha yê îranî, Mahmûd Ahmedî Nejad, bi vê kuştinê tawanbar kir. Wî li mêdyayan guwahiya (şehadet) bazarganekî çakkan ên alman, ku tê de îlan dike ku hema berê vê kuştinê wî di Tîrmeh 1989 de çek da bûn vî serokî belav kir. Û wî got jî ku wî 6 çekkên sivik bi riya balyozxana (sefaretxane) Îranê li Vyênna dan. PDKÎ jî Ahmedî Nejad bi vê kuştinê tawanbar dike. Hukûmeta Îranê hergav ev yek inkar kiriye.
*(azady.nl, 12.07.2009)*

Dr. Qasimlû di 1930 de li Urmiyê, li Kurdistana Îranê, bû bû. Wî li zanîngehên Parîs û Pragê xwendi bû. Piştî stendina doktorayekê di zanînên aborî de, ew li van zanîngehan bû mamoste. Piştî ketina Şahê Îranê, Dr. Qasimlû vegeriya Kurdistana Îranê û tê de, li serê partiya xwe, şerrekî çekdarî li dijî rejima Komara Islamî kir.

Sersaliya 20mîn a kuştina vê kesahiya (şexsiyyet) kurdî, ku bi sifetên xwe yên mirovî û ronakbîrî yên bilind navdar e, li Kurdistana Îranê û hema li herderê Ewropa hat kirin.
*(Buroya Kurdî, 13.07.2009)*

**BOMBEKIRINA KURDISTANA IRAQÊ**

***Di 17 Tîrmeh 2009 de***, firokeyên îranî gundên Mîrka Dukan, Lolan û Kila Şîn, ên navçeya Soranê, li Kurdistana Iraqê, bombe kirin. Kesek bi giranî birîndar bû. Di heman (eynî) demê de, çiyayên li dora gundên Razga û Mardo, li navçeya Pişderê, hatin bombe kirin. Zararên maddî bûn û rûniştevan tirsiyan.
*(pukmedia.com, azady.nl, 18.07.2009)*



www.arsivakurdi.org

**RAGIRTINÊN GIRSEYÎ**

***Di 22 Tîrmeh 2009 de***, buroya pêwendiyên navneteweyî ya Patî Dêmokratî Kurdistana Îranê (PDKÎ), ku li Fransa ye, daxuyaniyeke çapemeniyê weşand û tê de ragirtinên girseyî li Kurdistana Îranê, nemaze li bajarên Mahabad, Bokan û Saqezê, di 14 Tîrmeh 2009 de, riswa kirin. Ev yek piştî girtina firoşgehan (dikkan) ji aliyê bazarganên kurd di 13 Tîrmeh 2009 de, ji bo 20mîn sersaliya kuştina Dr. Qasimlû (li jor binêre). Daxuyanî bangî UN û rêxistinên navneteweyî dike ku li hemberî van ragirtinan rawestin.

**FOTOYEKE DÎROKÎ YA 30 SALÎ**



***Di 27 Sibat 1979 de***, fotoyeke ku gullekirina 11 xortên kurd li nêzîkî firokexaneya Sinê, li Kurdistana Îranê, nîşan dide li hemî cihanê gerriya. Ew ji aliyê fotokêş Cihangîr Remzîzade, li bin navekî derewîn, hati bû kişandin û piştre ji aliyê Ajansa Unites Press hati bû belav kirin. Di 1980 de, vê fotoyê xelata mezzin a Pulizerê stend. Fotokêş bitenê di 2006 de navê xwe yê rast aşkere kir.
*(avestakurd.net, 18.07.2009)*

**XWEPÊŞANDANEKE MEZZIN LI URMIYÊ**

Polîsê îranî ku li mîlîtanên PJAKê (şaxa îranî ya PKKê) digerriya ket malekê li Urmiyê û tê de xwediyê xanî û kurrî wî yê 6 salî kuştin. Bi hezaran kes li kuçan xwe pêşan da (meşiyan) û duruşmên (slogan) li dijî Komara Islamî avêtin.
*(avestakurd.net, 21.07.2009 ; rizgari.org, 22.07.2009)*

**RAGIRTINA XWENDEKAREKÎ**

***Di 27 Tîrmeh 2009 de***, hêzên ewlehiyê li Kirmanşahê Saman Valadbegî, xwendekar û çalakvan li dibistana endaziyê (hendese) li Kirmanşahê, ragirt. Ev yek, ji bo ku wî di wê rojê de bi hinceta bîranîna kuştina xwendekarekî, Kyanûs Asa, di dema pevçûnên ku piştî hilbijartinên serokî li Îranê bû, peyivî.
*(hra-iran.org, 28.07.2009)*

## KURDISTANA SÛRIYÊ

**KUŞTINA DU SERBAZÊN KURD**

***Di 29 Hezîran 2009 de***, xortekî kurd ê 19 salî, Muhammed Hillê, ji bajarê Kobanî, du meh piştî destpêkirina xizmeta leşkerî hat kuştin.
*(avestakurd.net, 01.07.2009)*

***Di 08 Tîrmeh de***, serbazekî (esker) din, Muhammed Omer Xidir, ji bajarê Dirbêsiyyê, di dema xizmeta leşkerî li Humsê de hat kuştin, Rêxistina Kurdî ji bo Parastina Mafên Mirov û Azadiyên Giştî, DAD, da zanîn.

Li gora malpera entêrnêtê Serwe, ji dema serhildana kurdî di 2004 de, 24 serbazên kurd hatine kuştin.
*(amude.com, avestakurd.net, 09.07.2009 ; netkurd.com, 21.07.2009)*

**RÊXISTINEKE ALMANÎ SÛRIYÊ TAWANBAR DIKE**

***Di Tîrmeh 2009 de***, rêxistina almanî « Rêxistina ji bo Parastina Gelên Tehdîdkirî », ku li Göttingenê ye, namîlkeyeke (broşur) bi navê « Kurdên Sûriyê hatine pelixandin » belav kir. Ew tê de ramyariya (siyaset) erebkirinê ji 1962 de, ragirtina siyasetvan û parêzerên mafên mirov, kuştina serbazên kurd di dema xizmeta leşkerî de û lihevkirineke nuh di navbera Almnya û Sûriyê de ji bo vegerandina 7.000 penaberên sûrî, ku piraniya wan Kurd in, bo Sûriyê teşhîr dike.
*(rizgari.org, avestakurd.net, 20.07.2009)*

www.arsivakurdi.org

# NÛÇEYÊN ÇANDÎ YÊN KURDÎ

**KURDEKÎ SEDSALÎ**
***Di destpêka Tîrmeh 2009 de***, Kurdekî Tirkiyê, Nuri Öztünç, 125 saliya xwe pîroz kir. Ew li Beytulşebabê di 1885 de bûye û saxiya wî gelek baş e. Li gora wî, ev bi saya jiyana di nav xwezayê (tebîet) de û xwarin û vexwarina baş : heşînayî, mast, goşt û ava hênik.

Nuri Öztünç 8 zarok, 45 nevî û 20 zarokên neviyên wî hene. Di dirêjayiya jiyana xwe de, wî 3 şah, 11 serokkomar û 60 hukûmet dîtin.
*(avestakurd.net, serwext.com, 04.07.2009)*

**ROJNAMEYEKE KURDÎ YA NUH LI JAPONÊ**
Rojnameyeke nuh a hefteyî ya kurdî ya 4 rûpelî, Peyman, bi zimanê japonî ji aliyê Rêxistina Hevaltiya Kurdistan û Japonê tê weşandin. Rûpela pêşîn bi ingilîzî û her sê rûpelên din bi kurdî û japonî ne.

Di hejmara xwe ya pêşîn de, rojname li ser pêwendiyên di navbera Kurdan û Japoniyan de dipeyive û balan dikişîne rewşa Kurdan li Japonê. Vê rêxistinê par li Hewlêrê buroya xwe vekiri bû û şaxeke wê li Tokyo heye.

Berpirsiyara rojnamê, Sena Çelik, got ku ew gelek dereng derketiye û ku ewê pêwendiyên aborî, ramyarî û çandî di nav her du gelan de xurttir bike.
*(netkurd.com, 10.07.2009)*

**PIRTÛKEKE HELBESTAN BI ALMANÎ**
Pirtûka helbestan a helbestbanê kurd ê Iraqê, Şêrko Bêkes, „Mêvanê Payîzê“, bi almanî „Der Gast Des Herbstes“ ji aliyê weşanxana Berfîn hat weşandin. Wergerandina ji kurdî bo almanî ji aliyê Sîrwan Rehîm û Karin-Sarah hat kirin. 121 rûpelên wê hene.
*(avestakurd.net, 15.07.2009)*

Şêrko Bêkes helbestvanekî navdar e. Ew bi salan li sirgûnê, li Swêdî, jiya. Dema ku Kurdistana Iraqê ji Saddam Huseyn rizgar bû, vegeriya welatê xwe û bû wezîrê çandê.
*(Buroya Kurdî, 16.07.2009)*

**YANEYEKE KURDÎ YA FUTBOLÊ LI IRAQÊ BI SER DI KEVE**
***Di 15 Tîrmeh 2009 de***, di maçeke futbolê de, yaneya (êkîp) kurdî ya Hewlêrê li dijî yaneya Necefê, bi 3-2 bi ser ket. Ev cara 3mîn de ku ev yane di lîzên Iraqê de bi ser dikeve.
*(peyamner.com, netkurd.com, avestakurd.net, 16.07.2009)*

**RÛSYA OLA YEZÎDÎ NAS DIKE**
***Di Tîrmeh 2009 de***, li ser daxwaziya Kurdên Yezîdî ku li Rûsya dijîn, hukûmeta rûsî ev ol bi awakî fermî (resmî) nas kir. Ev yek piştî vekolîneke (ankêt) encumeneke pispor û danişmendan (muşawir), ku ji aliyê wezareta dadê (edalet) hat pêk anîn.

Vê encumenê rapporek amade kir û tê de amaje (işaret) kir ku Yezîdîtî ji sedsala 14-15 de heye, ku ew di bin kartêkirina (te’sîr) Zerdeştî, Filletî û Islamê de ye û ku oleke kevn a Mêzopotamya ye.

Rappor dibêje ku ji sedema pelixandina wan, Yezîdî îro li Kurdistana Iraqê, Tirkiye, Îran, Sûriye, Ermenistan, Almanya, Kanada û Amerîka belav bûne. Ew texmîn dike ku jimara wan nêzîkî 2 milyon e.
*(netkurd.com, avestakurd.net, 23.07.2009)*

**PIRTÛKÊN EWROPÎ TÊN WERGERANDIN KURDÎ**
***Di Tîrmeh 2009 de***, weşanxana Lîsê, ku li Diyarbekirê ye, bi alîkariya konsulxana Swêdê li Istanbûlê, dest bi wergerandina pirtûkên ewropî yên girîng bo kurdî kir. Wê nuha 4 pirtûkên nivîskara swêdî ya navdar Asa Lind wergerandin.
*(serwext.com, 24.07.2009)*

**DU ZAROKÊN KURD DI YARIYEKE MUZÎKÊ DE LI SÛRIYÊ BI SER KETIN**




***Di Tîrmeh 2009 de***, li Sûriyê yariyeke (musabaqa) muzîkî ji bo zarokan, li hemî welat, bû. Du zarokên kurd, keçek „Janda“, 10 salî (akkordêon), û kurrek „Lewend“, 11 salî „tenbûr“, ên yekemîn derketin. Ew ji bajarê Amûdê, li Kurdistan Sûriyê, ne û mamosteyê wan, Selaman Şêxê, jî kurd e.
*(avestakurd.net, 27.07.2009)*



www.arsivakurd.org

**XWENDINA HELBESTÊN FEQIYÊ TEYRA**

***Di 26 Tîrmeh 2009 de***, li „Fêstivala Çand û Hunerê ya bajarê veşartî Muksê“, li parêzgeha Wanê bû. Parlementereke partiya desthilatê AKPê, Gülşen Orhan, helbestên helbestvanê navdar Feqiyê Teyra, bi amadebûna wezîrê dewletê Egemen Bağış, parêzgarê (walî) Wanê û kesahiyên din, xwendin.

*(netkurd.com, 27.07.2009)*

Feqiyê Teyra (navê wî yê rast Mehemed Feqî ye) li sedsala 14mîn Piştî Zayînê jiya. Ew helbestvanekî lîrîkî yê mezzin bû. Wî zimanê çivîkan dizanî bû, loma navê wî hat kirin „Feqiyê Teyra“. Ew yek ji kesên pêşîn ku nedadiyê (neheqî) li gelê kurd teşhîr dikir bû.

*(Buroya Kurdî, 28.07.2009)*

BRUSSELS HOOFDSTEDELIJK GEWEST
VLAAMSE GEMEENSCHAPSCOMMISSIE

Ev bulten, bi alîkariya Vlaamse Gemeenschapscommissie (VGC), bi kurdî, fransî, hollandî û ingilîzî hatiye weşandin.

www.arsivakurdi.org